

Agahdarîname: **Canada Child Benefit**

Yarmetiya Zarokan ya Kanadî (**Canada Child Benefit /CCB**), qaseke pereyan ku bac lê nakevin her mehekê tê dayîn bo malbatên xwedîmaf in daku alî wan bike ji bo mesrefên mezinkirina zarokên wan ên binî 18salî.

Ji temûza 2016an **CCB** şûna **Canada Child Tax Benefit (CCTB)** girt, û şûna **National Child Benefit Supplement (NCBS)** jî û **Universal Child Care Benefit (UCCB)**. Heger hûn ji xwe **CCTB** an jî **UCCB** werdigirin, hewce nake hûn daxwaza **CCB** jî bikin. Ew ê xwe bi xwe tevî hev bibin.

Daku tu bibî xwedîmaf, divê hemî şertûmercên han li ba we bin:

- Divê hûn bi zarok re bijîn, û divê zarok binî 18salî be;
- Divê hûn kesên sereke yê ku li ser xwedîkirin û mezinkirina zarokan bin. Ji bo agahîne bêtir derbarê danasînen xwedîkirina sereke, ji kerema xwe serî bidin li [broşora **Canada Revenue Agency \(CRA\)**](#).
- Divê hûn niştecihên Kanadayê bin; û
- Hûn an jî hevjinê/a we an jî şirkê/a we li gorî qanûna giştî divê hemwelatiyek Kanadî be, an jî xwedî mafê niştecihbûna daîmî, an jî kesê/a parastî an jî xwedî mafê niştecihbûnê a demkî yê/a ku bi kêmanî di 18 mehên dawîn de li Kanadayê jiyaba.

Daku hûn daxwaz bikin:

Divê [Forma **RC66, Canada Child Benefits Application**](#) bi temamî bê dagirtin.

Sebaret bi penaberên vê taliyê niştecih bûne divê [Demnameya **RC66SCH, Status in Canada/Statement of Income**](#) jî bi temamî bê dagirtin.

*Heger temenê zarok bêtirî salekê ye an jî ne li Kanadayê hatibe dunyayê, divê hûn îsbatek li ser jidayikbûna zaro lê zêde bibik. Ji bo agahîne bêtir derbarê belgehên qebûlkirî, ji kerema xwe binêrin li Part 4 ji forma **RC66**yê.

Ku formên we temam bûne, daxwaznameya xwe bişînin navenda bacê yaku li herêma we kar dike. Lîsteyek cih û adrêsan li ber dest e li ser: www.cra-arc.gc.ca/bnfts/ddrss-eng.html hene.

Bi awakî alternatîv, heger di nava sala bacî ya dawî de hûn li Kanadayê niştecihbûbin, hûn dikarin online li ser internetê daxwaza xwe pêşkêş bikin li ser malpera **CCB**yê: www.cra-arc.gc.ca/myaccount/index.html.

Ji kerema xwe balê xwe bidin: **Pêdivî nîne** bi nixandina dahata diravî bo temmakirina daxwaznameyê. **RC66SCH** dê bê bikaranîn bo nixandina dahata diravî ya malbatê. Lê dîsa jî, ji bo hûn berdewam bikin ki ser wergirtina alîkariyên han di pêşerojê de, divê hûn hemû beyannameyên bacê dagirin ji bo armancên hesabkirinê. Divê ev beyanname her salekê piştî hatinê bîn dagirtin daku teqez bibin ku alîkariyên **CCB** dê bidomin.

Dema Karkirinê

Payîn ji **CRA**yê tê kirin ku têkilî li gel daxwazker deyne derbarê daxwaznameyê di nava 80 rojên salnameyê de pişt wergirtina daxwaznameyê. Heger piştî derbasbûna 80 roj, we piştrastkirineke daxwaznameyê wernegirt, telefonî **CCB** yê bikin daku bipirsin. Piştî ku daxwaz hatibe karkirin, nîşeyek ji aliya **CCB** dê were şandin destnîşan dike ka alîkariya ku dê

bê wergirtin çiqasî ye. Peredana bo **CCB**yê li gorî bernameyên cihî û herêmî ne û dê her mehekê bi riya postê an jî weke direct debit li ser hesabê we ya bankê bîn şandin. Adeten demek bendîmanê ya 3-mehî heye beriya ku çêka yekem bê wergirtin. Di nava yekem peredanê de, pereyên hemû mehên borî yên ku ew kes tê de xwedîmaf bû bo wan pereyan. Lê dîsa jî, **CRA** dikare tenê pere bo 11mehên borî yên berî wergirtina daxwaznameyê bide, lewme gelek girîng e mirov heta jê were zû daxwaznameya xwe bi rê bike.

Têbîniyeke girîng ji bo haletên **Joint Assistance Sponsorship (JAS):**

Resettlement Assistance Program (RAP) dê qasa pereyan ku malbat dê werbigrin di nava dema bendîmanê de li ser çêkên wan ên mehane zêde bike. Lêbelê, ku malbat yekem çêka **CCB**ya xwe werbigirin yaku hemû pereyên ji dema hatina wan tê de ne, divê ew malbat pereyên **CCB**yê yên sê mehên borî careke din bide **RAP**yê. Gelek girîng e kesên nûhatî derbarê vê bîn agahdarkirin daku budce bi awakî birêkûpêk bê danîn.

Yarmetiyên Diravî yên Herêmî

CRA van hemû yarmetiyên diravî bi rê ve dibe: **Alberta Family Employment Tax Credit, BC Family Bonus, New Brunswick Child Tax Benefit, Newfoundland and Labrador Child Benefit, Northwest Territories Child Benefit, Nova Scotia Child Benefit, Nunavut Child Benefit, Ontario Child Benefit, û Yukon Child Benefit.** Lewme hewce nake hûn yek bi yek daxwaz ji vana bikin li gorî bernameya han. **CRA** dê bi xwe li agahiyên di daxwaznameya **CCB**yê de bi kar bîne daku biryar bide derbarê mafdariya wergritina ji van bernameyan.

Yarmetiyên Diravî yên din

Lênêrîngeha Zarokan bo Kêmkirina Mesrefan

Penaberên ku ji aliya kesên taybet tî sponsorîkirin (**PSRs**) dikarin dawxwaza yarmetiya han bikin madem yek kes jî piştgiriya zaro dike. Mesrefên lînêrîna li zarokan ew qasên pereyan ku bo kesek tî dayîn daku li zarokekî xwedîmaf binêre bi awakî kesa/ê han bikaribe:

- Dahata diravî ji karekî werbigire;
- Li ser karê xwe berdewam bike an bi tena xwe an jî weke hevbeş;
- Biçe dibistanê (şertûmerc di 'bernameyên perwerdehiyê' de hatine rêzkirin);
- Berdewam bike li ser lêgerîna xwe an jî çî karên nêzîk, yên ku diyariya han ji boyê hatiye dayîn.

Divê ev peredanên bo mesrefên lînêrîna li zarokan bo van kesan bin:

- Kesê/a li zaro dinêre;
- Dayîngehên zarokan û navendên lînêrîna li zarokan yên bi roj dixebitin;
- Enstîtuyên perwerdehiyê, ew jî ji wê behra pereyan yaku ji bo xizmetguzariya lînêrîna li zarokan.
- Kamp û dibistanên werzişê yên bi roj cihê ku ermanca sereke ya kampê lînêrîna li zarokan e (enstîtuya ku bernameya xwendinê ya werzişê dide weke dibistaneke werzişê nayê hesêb); an jî
- Dibistanên navxweyî, dibistanên werzişê yên şevîn, an jî kampên ku cihê mayîne lê heye.

Krêdiya **Googs and Services Tax/Harmonized Sales Tax (GST/HST)**

Ev krêdiya **GST/HST** qaseke pereyan carek tenê tê dayîn bo alîkariya kes û malbatên xwedî dahateke diravî kêman jî nivnîv ji bo behreke ji **GST** an jî **HST**yên ku ew didin.

Bo agahiyên bêtir sebarêt bi krêdiya **GST/HST**yê ji kerema xwe serî bidin li:

Navendên Bacê

Winnipeg Tax Centre

PO Box 14005 Stn Main

Winnipeg, MB, R3C 0E3

Berpîrs e li ser : Alberta, Manitoba, London-Thunder-Bay-Windsor (ON), Saskatoon (SK)

Surrey Tax Centre

9755 King George Highway

Surrey, BC, V3T 5E1

Berpîrs e li ser: British Columbia, Regina (SK), Yukon

St. John's Tax Centre

PO Box 12071 Stn A

St. John's, NL, A1B 3Z1

Berpîrs e li ser: New-Brunswick, Newfoundland and Labrador, Nova-Scotia, Kingston-Peterborough-St-Catherine's (ON)

Shawinigan-Sud Tax Centre

PO Box 3000 Stn Main

Shawinigan-Sud, QC, G9N 7S6

Berpîrs e li ser: Nunavut, Ottawa-Sudbury (Li gorî koda postê) (ON)

Sudbury Tax Centre

PO Box 20000 Stn A

Sudbury, ON, P3A 5C1

Berpîrs e li ser: Barrie-Sudbury (Li gorî koda postê)-Toronto (ON)

Summerside Tax Centre

102-275 Pope Road

Summerside, PE, C1N 5Z7

Berpîrs e li ser: Belleville-Hamilton-Kitchener/Waterloo (ON), Prince-Edward Island

Refugee Sponsorship Training Program

Tel: 416.290.1700, 1.877.290.1701

Fax: 416.290.1710

E-post: info@rstp.ca, Malper: www.rstp.ca